



Bernameya hunerî

KURMANJI

Utbildningsinfo

Skolverket

**Bernameya hunerî
bernameyeka amadekirinê
ji bo xwendina bilind e û
bidestxistina dîplomeya
amadebûna ji bo xwendina
bilind armanca wê ye.**

Bernameya hunerî ji te re ye yê ku hez dike di warên hunerî, însanî û civaknasî de kar bike. Ev xwendin ji bo domkirina xwendina madeyên hunerî, însanî û civaknasî di perwerdeya bilind de bingeh e.

PÊNC PISPORIYÊN CUDA

Wêne û formdan

- Tu dê zanyariyan li ser teknîkên amadekirina wêneyan werbigirî. Tu dê şiyana xwe ya derbirîn û danûstandina bi çavan û herweha ya ceribandin, şirovekirin û fikirîna bi perspektîvên cuda pêşde bibî.

Dans

- Tu dê zanyariyan li ser dansa hunerî ya li ser sehneyê werbigirî. Tu dê şiyana xwe ya teswîrkirin û danûstandinê ya bi rêya dansê pêşde bibî. Tu dê fêrî têkiliya di navbera teknîka dansê, afirandin, çalakiya li ser sehneyê û çawaniya tecribekirina dansê bi perspektîvên cuda bibî.

Huner û medya

- Tu dê zanyariyan li ser medyayên dijîtal werbigirî. Tu dê şiyana xwe ya danûstandina bi rêya alavên dijîtal yê ku tê de deng, wêne û vegotin navendî ne pêşde bibî. Tu dê bi perspektîvên cuda derbirînên dijîtal biceribînî, şirove bikî û lê bifikirî.

Muzîk

- Tu dê zanyariyan li ser muzîka ji dem û çandên cuda werbigirî. Tu dê bikaranîna muzîkê, afirandina hunerî û şiyana xwe ya ceribandin û şirovekirina muzîkê bi perspektîvên cuda pêşde bibî.

Şano

- Tu dê zanyariyan li ser şanoyê werbigirî. Tu dê şiyana xwe ya teswîrkirin, danûstandin, ceribandin û şirovekirina teswîrkirinên şagirdên din û nîşandanên şanoyî yê profesyonel jî bi perspektîvên cuda pêşde bibî.

Tiştên ku tu di vê bernameyê de fêr dibî

Tu dê zanîna xwe di warê formên derbirînê yê hunerî pêşde bibî. Tu dê zanyariyan li ser mirovî di serdemê, dîrokê û cîhanê de bi perspektîvên cuda werbigirî. Tu dê kar bikî ji bo ku huner û kulturê biafirînî, biceribînî û şirove bikî û herweha meşqê li ser karê destan yê hunerî bikî.

Di vê xwendinê de, bal li ser behremendî, meraqdarî, danûstandin, hevahengî, afirandin û pêşkêşkariyên te ye.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameya hunerî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tendiristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernamîyên amadekirina ji bo xwendina bilind de, tu kursên teorîk yê zêdetir ji yê bernamîyên pîşeyî dixwînî.

Madeyên taybetmend yê hevbeş yê bernamîyan ev in: danûstandin û hunersaziya hunerî û kultur.

Îmkan heye ku tu di bernamîyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bername kûrkolîn (programfördjupning). Ev dikare madeyên wek mîmarî, sîrk, fesal, afirandina dijîtal, çekirina berhemên film û tv-yê, felsefe, matematîk, komunikasyona medyayî, teoriya muzîkê, psîkolojî, civaknasî, şano, meşqzanî û teknîka webê bin. Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Tu dê bi rêya wesîleyên derbirînê yê hunerî fikir û hiziran bidî û bistînî û rêbazên hunersazî û zanistî jî biceribînî. Tu dê minaqeşeya xebatên xwe û yê kesên din bikî û fehmkirina xwe ya ji bo kalîte û danûstandinê pêşde bibî. Tu dê hevkarîyê bi warên din yê hunerî û herweha kulturnasî, dîrok, ziman, pêşxistina teknîkê û komunikasyonê re bikî. Tu dê xwe fêr bikî ku tu berpirsiyariya karê xwe bikî û înfomasyonan binirxînî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawîya Bernameya hunerî de projeyeka lîseyê amade bikî. Tu dê karekê mezin yê ku li ser warên zanyarî yê giring yê bernamîyê ava dibe plan bikî, pêk bînî û hilsengînî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên taybetî yê xwendineka bilind bi dest bixî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.